

Tedbîrên jîr ên COVID ji bo dibistanan

Agahî ji bo malbatan

Em dizanin ku bûyîna bi hev re di polê de, ji bo hînbûn, mezinbûn û başbûna xwendekarên me tiştê herî baş e. Ji bo ku em hem tenduristiya xwendekarên xwe hem jî hawîrdora hînbûna hevgirtî û berhemdar pêş bixin, em ê vê termê berdewam bikin.

Heger ne baş bî li malê bimîne

- Heger zarokê we ne baş be, divê hun wan li malê bihêlin. Heger nîşanên COVID-19 ên nerm jî nîşan bidin, divê têsteke COVID çê bikin û îzole bikin.
- Zarokê we dikare vegere dibistanê tenê dema ku têsteke neyînî vegeirîne û ew jî belaş in.
- Heger têsta zarokê we yê COVID-19 erênî be, encamên erênî bi Servîsa NSW (Service NSW) tomar bikin bikin, 7 rojan îzole bikin û rêberiyên tenduristiyê yên NSW bişopînin.

Vakslêdan

- Vakslêdanên ji bo COVID-19 û grîbê rêya herî baş e ji bo parastina xwe, malbat û civakê bikin. Vakslêdan rêyek ewledar û bi bandor e ku hun pergala xwe ya parastinê bidin destê alîkariya li dijî nexweşiyên vîrûsê
- Hemû xebatkarên guncaw ên eyarên sereke yên dibistanê û xwendekar bi awayekî xurt dihên teşwîqkirin ku bi vakslêdanên xwe ji bo parastina tendirûstiya xwe rojane bimînin. Ji bo parastina xwendekarên me yên ku di bin xetereya giran a COVID-19 de ne, divê hemû xebatkarên ku di dibistanan de ji bo armancên taybet dixebitin du caran vakslêdan bê kirin.

Kesên nêzîk

- Xwendekarên ku wekî têkiliyên nêzîk têne nas kirin dikarin biçin dibistanê lê divê dibistanê agahdar dikin û ew her sibe berî ku 5 roj temam dibin encama têsta COVID-19 ya neyînî vegeirînin.
- Xwendekarên lîseyê, ji bilî ji bo xwarin an jî werzişê divê li hundur maskeyê bikarbînin. Ji bilî xwarin an jî werzişê pêşniyar li xwendekarên dibistana seretayî tê kirin ku li hundur maskeyê bikarbînin.
- Destûr nayê dayîn ku tu xwendekarên ku bi têkiliyên nêz hatine nas kirin beşdarî eyarên zêde yên rîskê yên wekî rêwîtiyên şevê an jî kampên dibistanan bibin.
- Xwendekarên li dibistanan ji bo armancên taybet û yekîneyên piştevaniyê nikarin wekî têkiliyeke nêz biçin dibistanê û dê ji dûr ve di dema izokekirinê alîkariya wan bikin.

Têsta bi lez ya corona

- Heger zarokê we nîşanên COVID-19 ên nerm jî nîşan bide an jî her roj wek pêwendîyek nêz here dibistanê divê têtên antîjenê bîlez werin bikaranîn.
- Heger têtsta zarokê we ya COVID-19 erênî be, heta ku dema izole biqede û ew bê nîşan be jî divê neçin dibistanê. Encamên têtsta antîjenê yê pozîtîf divê li Servîsa NSW (Service NSW) qeydkirî bin.
- Heger têtsta zarokê we negatîf be lê hê jî nîşanên xuya dike divê neçin dibistanê heta ku bê nîşan be jî.
- Xebatkar û xwendekar dê di destpêka serdema 3yan da ji hêla dibistana wan ve ji 5 kîteyên têtstên antîjenê yê bîlez 1 pîrpakêt bibin. Xebatkar û xwendekarên li dibistanan ji bo armancên taybet û yekîneyên piştewaniyê dê di destpêka serdema 3 de ji hêla dibistana wan ve 2 pakêtên pîrhejmar ên 5 kîteyên têtsta antîjenê ya bîlez bi dest bixin.
- Disbistan dê têtstên antîjan yê covid bihêlin ji bo dema belvbûna nexweşiyê.

Paqijî û pakîrin

- Xwendekar tèn teşwîqkirin ku bi rêk û pêk destên xwe bi sabûn û avê bişon û li gorî têt xwestin alavên parastina şexsî bi kar bînin.
- Paqijîya rojê ya zêde ya dibistanan dê li ser qadên bîdestxistî û rûyên din ên hişk, destikên derî, dolab, şûşeyên ronahîyê û rêhesinên li pêlavan û qadên tevgerê hûr bibin.

Hewadan

- Hewaya paqij, ji bo kêmkirina rîska veguhastinê şeweya herî bi bandor a hewayê ye.
- Di mehên sartir da, ji bo hevsengîya rehetîya termal, germkirin dê bi metodên hewayê re were bikarînan.
- Ji bo ku astên guncaw ên hewayê û paqijkerên hewayê li ku derê pêwîst be, hemû cihên hînbûnê yê dibistanên dewletê hatin kontrolkirin.
- Bikaranîna qadên vekirî dê di dema pêkan da teşwîqkirina wan bidome.

Rûpêçan

- Li xwe kirina maskeyê, ji bo hemû xebatkar û xwendekarên di eyarên sereke yê dibistanê de, bi taybetî li cihên girtî û mînakên din ên ku hewastandin û dûrbûn ne gengaz e, bi awayekî xurt têt teşwîqkirin.
- Pêdivî heye ku mask ji bo hemî karmendên dixebitin bi xwendekarên di rîskeke mezin de ne heger tûşî COVID-19 bibin.
- Li xwe kirina maskeyê ji bo mêvanan gerek e, bi taybetî dema ku ew rasterast bi xwendekaran re têtildar dibin, û herwiha gerek e dema ewên kar dikin bi xwendekarên ku xetereya giran a nexweşiyek mezin dema tûşî COVID-19 bibin.
- Divê xwendekarên di pola 7an û jor de yê diçin dibistanê wek dema diçin dibistanê wek pêwendiyek nêz maskê bi kar bînin.

Rûpêçan berdewam

- Divê hemû xwendekar maske bi kar bînin heta 3 rojan piştî başbûna ji COVID-19.

Serdanvan

- Serdanvan bêyî ku rewşa wan a derzîkirinê/veksînlêdanê be jî dikarin biçin dibistanan.
- Hemû mêvan bi awayekî xurt dihên teşwîqkirin ku maskê bi kar bînin, bi taybetî li hundir an jî dema dûrbûn ne gengaz e û dema ku rasterast bi xwendekaran re têkilîyê datînin.
- Mêvanên ji bo armancên taybet û yekîneyên piştevanîyê yê ku karker û dilxwaz jî di nav de ne, heger rasterast bi xwendekaran re têkilîyê deynin divê maskeyê bi kar bînin.
- bo Serdanvanên ku weke pêwendiyê nêz diçin dibistanê, divê dibistanê agahdar bikin û şopandina hin rêgezan bikin, dema li hundir maskeyê bi kar bînin. Mêvanên ku têkilîyên nêzik in, nikarin ji bo armancên dîyar biçin dibistanan.

Çalaki

- Nirxandinên rîska tenduristî û ewlehîyê dê di plansazîyê de bîn kirin ku geşt û kampên şevkê jî di nav de hene.
- Dê û bav dê hay ji rîska aşkerabûnê hebin û ji bo hin çalakîyan divê destûrê bidin.

bersiv li hemberî rewşên herêmî

- Dibistan dê bi ekîba Gerînendetiya Rewşên Tenduristî, Ewlehî û Tenduristiya Karmendan re bixebitin da ku bi awayekî guncaw bersiva rewşên herêmî bidin, di nav de belavbûna nexweşiyên vîrûsî.
- Di hin rewşan de, dibistan dikarin bi demkî tedbîrên zêde bidin da ku ji bo rawestandina zincîra enfeksiyonê, di nav de pêdivî heye ku bi kar anîna maskê, paşxistin an jî sînorkirina çalakiyên ne-bingehîn û rêvekirina hin komên ku ji dûr ve fêr bibin.

Fêrbûna ji dûr ve

- Daîre, ji bo piştgiriya xwendekarên ku divê ji dûr ve fêr bibin, di pêşxistina çavkaniyên fêrbûna dijîtal de berdewam dike.

Ji bo pêzanînen zêdetir serdana education.nsw.gov.au/covid-19/advice-for-families

Servîsa wergêrên Telefonê

Heger pêdivîya we bi agahîyên zêdetir hebe, ji kerema xwe li midûrê dibistanê bigerin. Heger ji bo lêpîrsîna we hewcehîya we bi wergêrekî hebe, ji kerema xwe di 131 450 da li Servîsa Wergêrên Telefonê bigerin û bi zimanê xwe li wergêrekî bixwazin. Ji operatorê re hejmara telefona ku tu dixwazî bigerî bibêje û ji bo ku di axaftinê da alîkarîya we bike, operator dê wergêrekî li ser xetê bistîne. Servîsa wergêrîyê belaş e.

Hukmeta NSW biryar da ku operasyonên dibistanan berdewam bin, li dema ku pêşî li ewlehî û tendirûstîya xwendekar û karmendên dibistanê tê girtin.